



Rêberiya xerîdar - peywirdarên koçberiyê yên qeydkirî

Ne yasayî ye ku kesek alîkariya koçberî li Australya bide, eger ew kes ne kargêrê koçberiyê yê qeydkirî (registered migration agent) be, karmendê qanûnî yê Australya be an jî kesek bexşandî be. Her kesê ku li Australya alîkariya koçberiyê ya neqanûnî bide, divê bête raportkirin bo [Border Watch Online Report](#) li ser malpera Department of Home Affairs. Pir giring e mirov bizanibe ku kesê alîkariya pirsgeka te ya koçberiyê bike garantîyê nede te ku vîzeyê bide te.

Peywirdarên Koçkirinê yên Qeydkirî

Divê peywirdarên koçberiyê yên qeydkirî li gorî rêgezên pîşeyî bin, Li gorî Şertê Tevgerkirinê bin û zanîna yasa û pêvajoyên koçkirinê yên heta roja îro berdewam bikin.

Hemû peywirdarên koçberî yên qeydkirî xwedî Migration Agents Registration Number (MARN). Hûn dikarin kontrol bikin ka kesek li ser qeydkirî ye li ser malpera OMARA www.mara.gov.au

The **Office of the Migration Agents Registration Authority (OMARA)** parçeyek ji Department of Home Affairs û saziyek birêkûpêk e ji bo peywirdarên koçberiyê yên qeydkirî li Australya. OMARA:

- serlêdanên ji bo tomakirina wekî peywirdarên koçberiyê li Australya dinirxîne û biryar dide
- rêveçûna peywirdarên koçberiya qeydkirî dişopîne, gilî û gazinan lêkolîn dike û eger pêwîstî pê hebe disîplîne digire.

OMARA nikare alîkariya we bike di serlêdana vîzeyan yan sponsoriyê de an ferman bide karbidestekî koçber ê qeydkirî ku xercên ji bo we vegeand.

Şertê Tevgerkirinê

Ji bo peywirdarên koçberên qeydkirî şertê tevgerkirinê tê xwestin ku peywirdarên koçberên qeydkirî ji:

- Di derheqê şansên we yên wergirtina vîzeyê de rast bin
- Şîretek dirust pêşkêş bikin û we agahdar bikin ku pêşkeftina serlêdana we û her guhertinên ku bandorê li ser bikin
- Li gorî qanûnê kar bikin, ji bo berjewendiyên we û nepenîtiya we biparêzin
- ji we re bibêjin eger berjewendiya wan hebe ku bi berjewendiyên we re şer dike û çalakiyeke guncaw pêk bîne

- beriya ku dest bi xebata li ser xizmetên ku wê werin kirin bike, texmîna xerc û lêçûnên din werin kirin di daxuyaniyeke nivîskî bidin we
- para di hesabek bankê yê cuda de bihêle eger we para pêşinde de dan
- fatûreyekê bi karûbarên rastîn yên qedandî û papyên divê hun bidin bide we
- li ser pêvaka serlêdana we tomarên baş hildin.

[Code of Conduct](#) bi temamî li ser malpera OMARA hene.

Metirsiyên li ser peywirdarên koçberên qeydkirî

Eger pirsgeka we bi ajanê we yê koçberê qeydkirî re hebe, pêşî hewl bide bi wan re çareser bike. Eger hun nikarin meseleyê bi wekîlê xwe re çareser bikin, eger hûn hewceyî alîkariyê bin hûn dikarin bi OMARA re têkiliyê deyne. Hûn dikarin gilî li ser peywirdarê xwe yê koçberiyê yê qeydkirî bikin bi temam kirina [complaint form](#) li ser malpera OMARA.

Gilîkirin wê bandorê li serlêdana vîzeyê we neke, û ne jî li encama biryara berê ya redkirina vîzeyê bigherîne yan jî biryara rakirinê.

Karmendên Australî yên yasayî û kesên bexşandî

Hin kes, wek karmendên qanûnî yên Australya û kesên bexşandî, ne pêdvî ye ku wek peywirdarên koçberiyê qeydkirî bin da ku alîkariya koçberiyê li Australya peyda bikin.

Divê pisporên qanûnî yên Australya li gorî qaîdeyên tevgerkirina pîşeyî ya desthilata xwe ya hiqûqî ya tîkildar tev bigerin. Ger hûn dixwazin gilî li ser karmendên qanûnî, vê bixwînin 'Consumer guide – legal practitioners', li ser [Department of Home Affairs website](#) heye.

Kesên bexşandî endamên malbatê yê nêzîk in û sponser in. hun dikarin listeya kesên bexşandî li ser [Form 956 – Appointment of a registered migration agent, legal practitioner or exempt person](#) bibînin. Kesên bexşandî nikarin ji bo pêşkêşkirina alîkariya koçberiyê para bidin.

Tunekirina randîvuyê

Eger hûn dixwazin randevûyê bi dawî bikin [Form 956](#).

Servîsa Wergerandinê

Bi wergêrekî re bi riya Servîsa Wergerandinê re (TIS National) bipeyivin

www.tisnational.gov.au ☎ 131 450

Tîrmeha 2021